

## Dengrêziya kurdî

HELSÎNKÎ, 3/1 2014 — Peyv ji kêteyan (kiteyan, heceyan, bi inglîzî syllable) pêk tên. Peyv dikare yekkîteyî be, wek "av", dukîteyî be wek "bi-rin" yan pîrrkîteyî be wek "gi-han-di-bû-yê". Her parçeyeka peyvê, ya ku mirov dikare lê bêhna xwe bide berî ku parçeya din ya peyvê bibêje, kête ye.

Mebest ji dengrêziyê birêzkirina dangan di kêteyan de ye. Navê dengrêziyê bi navneteweyî "fonotaksi" yan "fonotaktîk" e, bi awayê xwe yê inglîzî "phonotactics" ji yûnaniya kevn "*phōnē*" (deng) û "*taktikós*" (birêzkirin). Li gor qeyd û bendên dengrêziya her zimanekî, birêzkirina hin dangan li pey hev mimkin e û hin jî ne mimkin e. Bo nimûne, di kurdî de "s" û "t" dikarin li destpêka peyvê hebin ("stêr, stem, standin") lê "n" û "d" nikarin dest bi ti peyvekê bikin (\*ndêr, \*ndem, \*ndandin – di vê nivîsê de stêrka \* nîşana wê ye ku ew form nîne yan ne mimkin e). Lê li dawiya yan nava peyvê hem "st" û hem jî "nd" dikarin hebin: "mast, rast, ristin" û "çend, çandin, bilind".

### Peydabûna dangan di peyvên de

Di dengrêziya kurmancî de mimkin e ku her herfa di kurdî de heyî dest bi peyvê bike: "av, baran, car, çav/çar, deng, ez, êvar, fanos, gemar, her/Hesen, izn, îro, jajî, kes, lêv /lep, mirov, nan, ode, pênc/perde/pez, qirêj, rev/..., ser/sed, şev, te/têr/teng/tep, Urdin, ûtî, van, wêran, xet/xem, yar, zirav/zanîn..." Bi nimûneyên bi nîşana "/" hatiye diyarkirin ku dengên cuda yê bi eynî herfê tên nivîsîn hemû ew deng dikarin li destpêka peyvê hebin. Tenê herfa R li destpêka peyvê herdem şidandî ye, ti caran li destpêka peyvê nerm nabe loma nîşana "/..." li ber wê hatiye danîn.

Hemû herfên kurdî dikarin li dawiya peyvê jî cihê xwe bigirin: "bA, baB, baC, maÇ/..., keD, dE, bÊ, maF, beG, reH/ruH, bI, kÎ, kaJ, maK, maL, maM, naN, bO, geP, reQ, meR/beR, beS/..., goT/.../moT/..., dU, bÛ, aV, eW, reX/giX, eY, beZ (rûn)/beZ (rev). Nîşana "/..." diyar dike ku ew deng di kurmancî de li dawiya peyvê nîne. Anku hemû herfên me dikarin li dawiya peyvê cihê xwe bigirin lê hemû deng nikarin. Dengên ku li dawiya peyvê di kurmancî de ne mimkin in awayên bihilm anku req (aspirated) yê ji van herfan in: Ç, K, P, T. Dengên wan yê wek di peyvên "çar, kar, perde, têr" de nikarin bikevin dawiya peyvê lê dengên wan yê wek "çav, kirin, pênc, te" li dawiya peyvê jî hene. Di kurmancî de herfa T du dengên din jî hene, wek di peyva "teng" de (bêhilm/unaspirated û qelew/emphatic) û wek "tep" (bihilm/aspirated û qelew/emphatic). Herfa P jî dengê serbixwe yê bêhilm û qelew heye, wek di peyvên "pez" û "piling" de. Ji van herdu herfan jî dengên wan yê qelew û bêhilm dikarin bikevin dawiya peyvê

lê deng qelew û bihilm (wek her dengê bihilm) nikare li dawiya peyvê cihê xwe bigire.

Anku dengrêziya kurmançî, ji bilî R-ya nerm, li destpêkê hemû dengan qebûl dike. Li dawiya peyvê jî hemû deng tèn pejirandin, ji bilî dengên bihilm/”req” (Ç, K, P, T yên bihilm/req). Rewşa nava peyvên xwerû/sade (peyvên ku ne ji çend peyvan pêk hatine) jî wek ya dawiya wan e anku her dengê ku li dawiyê hebe dikare li nava peyvê jî hebe.

Wek ku li jor hat gotin, her dengê kurdî dikare li destpêka peyvê be. Lê di rastiyê de hin deng li destpêkê mişe û pirr in, hin jî gelek kêr in. Her kesê ku çavekî li ferhengê kurmançî bigerîne, dê bi hêsanî bibîne ku, bo nimûne, peyvên ku bi dengê B yan D dest pê dikin bi sedan yan bi hezaran in. Lê peyvên ku, bo nimûne, bi Î yan O dest pê dikin tenê çend lib in (bi taybetî eger mirov peyvên bi ”î” yên ji erebî û peyvên bi ”o” yên ji zimanên ewropî hatî hesab neke.)

Heke mirov peyvên xwerû bihejmêre, mirov dikare bi awayekê gelemperî bibêje ku di kurmançî de peyv bi konsonantan (herfên bêdeng) pirr dest pê dikin û bi vokalan (bideng) kêr dest pê dikin. Lê di nav konsonantan bi xwe jî cudahiyeke gelek mezin heye: B, D pirr mişe ne, K, M, N, P, Q, R, S, T, X, Z têra xwe hene, Ç, Ğ, G, H, Ş kêmtir in, F, J, L, V, W, Y yekcar kêr in. Herçi vokal in, ”a” bi rêjeyî/nisbî li destpêka peyvan mişe ye tevî ku ne bi qasî konsonantên mişe be jî. ”E” li destpêka çend cînavên berbelav (ez, em, ew) hebe jî, wek din kêr e. ”Î” jî nadir e heke mirov peyvên pêkhatî yên wek ”îro, îşev, îsal” û peyvên biyanî jî nehejmêre. Ji bilî çend dengên gazîkirinê (of, oh, ox, of...) ”o” tenê di peyvên biyanî de peyda dibe. ”Û” wek peyveka serbixwe bi maneya ”herwiha” heye (wek ”ez û tu”) lê wek din bi çend peyvên biyanî yan navên deveran ve sinorkirî ye. Meseleya ”u” û ”û” yê aloz e: hin caran yek ji wan û carinan jî ya din tê nivîsîn: ”Urdin/Ûrdin”, Ukrayna/Ûkrayna”, ”urdûyî/ûrdûyî”. Bi heman awayî rastnivîsînê di meseleya ”i” û ”î” de jî cihê xwe negirtiye. Piraniya peyvên ji erebî yên bi ”i” dest pê dikin niha di kurmançiya nivîskî de bi ”î” tèn nivîsîn (îzin, îmtîhan, îhtîmal...) lê di rastiyê de dengê ”i” zêdetir li wan peyvan tê û çêtir hem nêzikî dengnasiya kurmançî ye û hem jî nêzikî orijînaliya wî dengî ye.

Berevajî destpêkê, li dawiyê peyvê vokal di di kurdî de mişe ne. Lê ne di peyvên xwerû de (av, bar, heval) lê di peyvên çemandî/tewandî de (avÊ, wî barÎ, hevalA min) yan jî di peyvên pêkhatî de (avÎ, hevalTÎ). Lê dîsa jî ”i” û ”u” li dawiya peyvê nadir in: Di zimanê nivîskî de ”i” tenê di van peyvan de: ”bi, çi, di, ji, li, ti” (li gel peyva ”mi” ku forma devkî ji cînavê ”min” e). ”U” tenê di van peyvan de li dawiyê ye: ”du, ku, tu” (li gel ”çu” ya devokî). ”O” paşpirtika forma gazîkirinê ya nêr ya kit e (hevalo! kurro!) û ”-ino, -no, -îno” jî yên pirrhejmar in (hevalino, hevalno, hevalîno!), wek din ”o” jî bi çend peyvên xwerû ve sinordar e: ”bo, co, ço, do, go, no, ro, xo” ku ew jî bi piranî devokî ne û di zimanê nivîskî de bi hin awayên din yên nivîsîn: do > duh/duhî, go > got, ro > roj, xo > xwe”.

## **Peyv ji kîteyan pêk tèn**

Her peyvek ji yek yan zêdetir kîteyan pêk tê. Eger peyvek wisa be ku mirov nikare di dema gotina wê de carekê yan çend caran bêhna xwe vede, hingê peyv yekkîteyî ye anku ji kîteyekê bi tenê pêk hatiye. Bo nimûne, peyvên ”av, ba, çav,

dest, e, stran” yekkîte ne ji ber ku mirov nikare di dema gotina wan de bêhna xwe vede. Lê peyvên wek ”ava, baran, çavê, destî, stranan” dukîteyî ne anku her yek ji wan ji du kîteyan pêk hatiye ji ber ku di navbera gotina her yekê ji wan de mirov dişê carekê bêhna xwe vede: ”a-va, ba-ran, ça-vê, des-tî, e-rê, stra-nan”. (“-” nîşana cihê bêhnvedanê ye anku ew tixûbê navbera du kîteyan e.)

Di kurdî de peyvên xwerû bi piranî – eger ne hemû – yekkîteyî yan dukîteyî ne. Peyvên pirrkîteyî (ji yek yan du kîteyan zêdetir) peyvên pêkhatî ne anku ji çend peyvên xwerû yan jî ji peyveka xwerû û paşpirtikan (sufiksên) hatine çêkirin: bo nimûne ”serokkomar” ji du peyvên serbixwe ”serok” û ”komar” yan jî ”şivanî” û ”revandin” her yek ji peyveka serbixwe ”şivan / rev” + paşpirtika ”-î /-andin” pêk hatiye. Li ber gelek zimanên din, rêjeya peyvên yekkîteyî di kurdî de mezîna e anku gelek peyvên xwerû yekkîteyî ne.

### **Avaniya kîteyan**

Çawa ku peyv dikarin li gor kîteyan bîna parvekirin, wisa kîte bi xwe jî li gor taybetiyên xwe tên dabeşkirin. Her kîte dikare ji yek, du yan sê beşan pêk bê.

### **Navik**

Di kurdî de di her kîteyê de bi kêmî vokalek (herfeka bideng) heye: ”a, e, ê, î, û, o, u, û”. Ew beşa kîteyê, ya ku ji vokalekê pêk tê, wek ”navik” yan ”kakil” tê binavkirin. Bi navneteweyî navê wê ”nucleus” e. Di kurdî û gelek zimanên din de kîte dikare tenê ji vê navikê jî pêk bê. Di kurdî de ”a, e, ê, î, û” ji xwe peyvên serbixwe ne jî. Lê wek din jî bo nimûne di van peyvên de kîteya pêşîn tenê ji navikê pêk hatiye: ”a-vê, e-rê, ê-var, i-zin, î-ro, o-de, u-mêd, û-tî”. Lê li navê yan dawiyê, ji bilî çend istisnayan, vokal nikarin bi tena serê xwe kîteyekê pêk bînin: ”î-di-a”.

Di her kîteyê de bi kêmî navik heye lê herwiha hin beşên din jî dikarin hebin. Konsonantên berî navikê ”serik” anku ”serkîte” ne (bi inglîzî ”onset”). Konsonantên li pey navikê jî ”dûvik” anku ”dûvkîte” ne (bi inglîzî ”coda”). Di peyva ”çav” ya yekkîteyî de ”ç” serik e, ”a” navik e û ”v” dûvik e.

### **Serik**

Serik dikare ji yek, du yan heta sê konsonantan pêk bê. Konsonantên kurdî: b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z. Her konsonanta kurdî dikare bi xwe bi tenê serikê pêk bîne anku li serê kîteyê be. ”ba, car, çav/çar, dest, ferz, gul, hûn, kaj, lez/lep, mal, nav, pênc/perde, rast/..., ser/sal, şev, te/têr/teng/tep, vîn, war, xet/xem, yar, zer...” Nîşana bertirr / nimûneyên bi eynî herfê lê bi dengên cuda diyar dike.

Çend konsonant – lê ne hemû – dikarin li gel konsonanteka din jî li destpêkê bin. Di peyvên xwemalî yê kurmanciya nivîskî de de tenê ”sp-, st-, şk-, xw-”. (spî, stêr, şkestin, xwê) dikarin serikê pêk bînin.

Heke em awayên devokî jî hesab bikin, hingê herwiha ”bw-, cw-, gw-, jw-, kw-, mwî-, nw-, sw-, tw-” (bwîk=bûk, cwîn=cûn/cûtin, gwîz=gûz, jwîjî=jûjî, kwîr=kûr,

mwî=mû, nwî=nû, swîr, twî=tû”) dikarin di serikê de hebin lê di kurmancî de li pey wan tenê vokala ”î” dikare hebe, ne vokalên din. Di soranî de piraniya van komên konsonantan li destpêkê di zimanê nivîskî de jî li kar in û li gel ”ê” ew şûna ”konsonant+û” ya kurmancî digirin: gwêz=gûz, nwê=nû... Ji bilî wan, di soranî de ”dw-” jî dikare li destpêka peyvê hebe: ”dwênê” (duhî, duh, do, roja berî îro). Lê li aliyekê din soranî di peyvên xwemalî de ”st-” ya di kurmancî de heyî qebûl nake (li jêrtir binêre).

Di peyvên ku vê dawiyê ji zimanên ewropî deynkirî de gelek komên din jî mimkin in: ”bl-, br-, fl-, fr-, gl-, gr-, kl-, kr-, pl-, pr-, sk-, sl-, st-, sw-, tr-: blanket, Brîtanya, flora, Frensa, glas, gramer, klasîk, krîz, plan, skelet, slalom, statîstîk, Swêd, traktor...

Ji bilî van, herwiha komeka sê-konsonantî jî di peyvên xwemalî yê kurmancî de heye û di hin peyvên ji zimanên ewropî wergirtî de jî peyda dibe: STR-: ”stran, strî, stratejî”. Herwiha SPR- jî di çend peyvên ji Ewropayê hatî de heye: ”sprey, spring, sprî”.

Heke serik ji komeka konsonantan pêk bê, konsonanta destpêkê di kurmanciya nivîskî de – peyvên ji ewropî jî pê re – dikare tenê ”b, f, g, k, p, s yan t” be (bi devokî û/yan soranî herwiha ”c, j, m, n” jî dibin.) Konsonanta dawîya serikê tenê dikare yek ji herdu dengên ruhn (liquid) ”l, r” yan jî dengê nîv-vokal ”w” be. Tek dengên ku dikarin bibin konsonantên navîn yê serkîteyê ”p, t” ne.

Zimanên cuda di qebûlkirina komên konsonantan de di serkîteyê de ji he cuda ne. Kurmanciya nivîskî di peyvên xwemalî de tenê ”sp-, st-, şk-” û belkî ”şt-” qebûl dike. Inglîzî gelek komên din jî yê konsonantan gelekên din jî dipejirîne (bo nimûne ”kn-” û ”wh-” ku tên nivîsên lê wek ”n-” û ”w-” tên gotin), swêdî bo nimûne tehemila komeka wek ”stj-” dike (stjärna: stêr, bixwîne ”sterna”) û rûsî jî li gel gelek komên din bo nimûne koma ”vl-” qebûl dike (Vladîmîr).

Di zaravayên din yê kurdî de û di formên standard yê zimanên cîranên kurdî de (erebî, farisî, tirkî) di peyvên xwemalî de ti komên konsonantan li destpêka peyvê nayên qebûlkin. Loma ”stêr” ya kurmancî yan bi sivikkirina koma konsonantan yan jî bi epentezê (zêdekirina herfan li peyvê) bi soranî bûye ”estêre”, kelhurî ”hesare”, lekî ”asare”, bi zazakî ”astare”, bi hewramî ”esarî” û bi farisî jî ”sêtarê”. Mesele ne ew e ku di kurmancî de peyv guherîne, ji ber ku di zimanên îranî yê kevn de wek kurmancî ”st-” li destpêka peyvê hebû: avestayî ”stêr”, pehlewî ”starek”, herwiha sanskrîtî ”star”, inglîzî ”star”, latînî ”stella”...

Helbet di farisî û erebî de vokalên kurt (e, i, u) nayên nivîsîn lê dîsa jî ew tên gotin. Di kurdiya bi alfabeya erebî jî de ”î” nayê nivîsîn lê dîsa jî tê gotin. Bo nimûne, bi soranî ”krdn” tê nivîsîn lê wek ”kirdin” tê gotin, ne wek ”kridin, kiridin, kirdn...”

Lê di kurmancî de jî komên konsonantan hatine sivikkirin. Bo nimûne, em bi kurdî dibêjin ”bira” û bi farisî ”berader” e lê di eslê peyvê de di gelek zimanên din de ne ”i” ya kurdî û ne jî ”e” ya farisî ya kîteya yekem heye: pehlewî ”brader”, avestayî ”brater”, sanskrîtî ”bhratar”, rûsî ”brat”, yûnaniya kevn ”phrater”, latînî ”frater”, inglîzî ”brother”...

Bi heman awayî zimanên îranî yê niha bi giranî ji komên konsonantan li destpêka kêteyê hatine rûtkirin. Bo nimûne, di farisiya hexamenişî de (nêzîkî 2300 – 2600 sal berî niha) dengê ”xş-” li destpêka peyvê normal bû (nimûne: ”xşep-xşayethe-” anku ”şev, şah”) lê ew deng di farisiya niha de nemaye. Ihtimalen eynî deng di kurdiya wê demê de jî hebû lê niha nemaye.

Heta eger niha kurmanciya nivîskî û hin devokên kurmancî peyvên wek ”stran, stêr” qebûl bikin jî, di gelek devokan de ew bûne ”sitran, sitêrk” yan jî ”istiran/histran, istêrk/histêrk”. Bi gotineka din, di kurmancî de jî nemana koma konsonantan li destpêkê li ser rê ye û tê – yan jî dihat.

Di eynî demê de tendenseka din di kurdî de cihê xwe digire. Van salên dawiyê bi sedan – eger ne bi hezaran – peyvên ewropî ketine kurdî ku tê de li destpêkê komeka konsonantan heye (blond, Brîtanya, flora, Frensa, glas, gramer, klasîk, krîz, plan, skelet, slavî, statîstîk, stratejî, sprej, Swêd, traktor...)

Berê koma konsonantên hin ji van peyvên dihat sivikkirin, bi taybetî ji ber ku ew bi rêya zimanên wek farisî, tirkî û erebî diketin kurdî: plan > pîlan, glas > gelas, statîstîk > îstatîstîk, Swêd > Îsweç, traktor > terektir...

Lê êdî bi taybetî kurdên ku yek yan çend zimanên ewropî dizanin van peyvên bê sivikkirina koma konsonantan dibêjin. Hê zû ye ku mirov pêşbîniya encameka mitleq bike lê ihtimalen hatina van peyvên ewropî û dengên wan dikarin rê li ber tendensa din, anku sivikkirina koma konsonantan, bigirin yan jî awayê eslî yê peyvên wek ”stêr” û ”stran” ji guherîna biparêzin.

## **Dûvik**

Konsonantên ku di kêteyê de dikevin pey navikê, ”dûvik” anku ”dûvkîte ne. Berevajî navikê lê wek serikê, dûvik jî di kêteyê de ne zerûrî ye. Bo nimûne di peyvên ”ba, di, mû, xwê” de yan di kêteya pêşîn ya her yek ji van peyvên de ”a-gir, we-lat, bi-har, dû-man” dûvik nîne.

Dûvik di kurdî de dikare ji yek yan du konsonantan pêk bê: ”giR, deST”. Bi hin peyvên esil-biyandê de dûvika sê-konsonantî ”-kst” heye: ”tekst”. Di peyva devokî ya xwemalî ”heşt” (heşt) de jî dûvik ji sê konsonantan pêk tê eger mirov niv-vokala ”y” jî wek konsonant bihejmêre.

Hemû konsonantên kurdî dikarin di kurmancî de bikevin dawiya kêteyê anku di dûvikê de peyda bibin: baC, xaÇ, daD, reF, beG, riH, kaJ, maK, maL/saL, eM, baN, reP, reQ, maR/meR, keS, geŞ, meT/moT, eV, eW, reX/baX, ey, beZ (rûn) / beZ (rev). Nimûneyên wek ”mal/sal, rex/bax, bez/bez” du dengên cuda yê bi eynî herfê tên nivîsîn diyar dike. Lê ”ç, k, p, t” yê bihilm (req, aspirated), nikarin di dûvikê de hebin ji ku ew tenê li destpêka peyvên dikarin peyda bibin.

Hin ji komên konsonantan yê di peyvên xwemalî de di serkêteyê de mimkin di dûvkêteyê de jî mimkin in: sp-, st-, şk (hesp, rast, meşk) lê komên bi ”konsonant+w” di dûvikê de nabin.

Li aliyekê dî, di dûvikê de gelek komên konsonantan mimkin in ku di serkîteyê de peyda nabin. Bi kêmî ev komên konsonantan di kurdî de li dawîya kîteyê peyda dibin: -nd (çend), -st (rast), -rt (girt), -ng (deng), -rd (kurd), -ft (şkeft), -xt (rext), -sk (misk), -şk (mişk), -şt (mişt), -sp (hesp), -rf (herf), -rb (kerb), -wt (mewt), -yd (eyd), -lb (qelb), -lp (qelp), -rs (birs), -rç (hirç), -ld (cild), -rz (ferz), -mb (duşemb), -mp (kemp), -nc (kinc), -rc (xerc)

Hin ji van komên konsonantan di kurancî de berbelav in, bo nimûne -nd, -st, -ng. Hin jê kêm peyda dibin: -ft, -rs. Hin jê sivik bûne: -rd (kurd > kur\_manc, bir\_in, bide ber soranî "birdin", zazakî "berdene".) Hin jî tenê di peyvên esil-biyânî de hene: -lb, -mp (hêjayî gotinê ye ku "berz" di kurancî de peyveka deynkirî ye, hevrehê wê ya kurancî "bil-ind" e). Hin jî hem esil-biyânî ne û hem jî tenê di çend peyvên de hene: -yd, -wt.

Çawa ku meyla sivikkirina koma konsonantan li destpêka kîteyê heye, wisa li dawîya wê jî heye. Ya balkêş ew e ku soranî, zazakî û farisî destpêka kîteyê sivik kiriye, kurancî dawîya wê: farisî "bord, mord", zazakî "berd, merd", soranî "bird, mird" lê kurancî ew sivik kirine, D ji pey R avêtiye: "bir, mir". Lê li aliyekî din di soranî û kelhurî de ji "-st" ya dawiyê gelek caran tenê "-s" û ji "-nd" ya dawiyê tenê "-n" dimîne (dest > des, nalbend > nalben). Ev heman diyarde di kurancî de jî hebûye: çend > çen, bend > ben/benik.

### **Cûnên kîteyan**

Em ê di vê tabloyê de hemû tîpên kîteyên kurancî pêşkêş bikin. Cûreya kîteyê çend zêdetir li jor be, wisa berbelavtir û mişetir e, çiqas jêtir be jî nadirtir e û kêmtir peyda dibe. C: konsonant, V: vokal. Eger nimûne di kevokan de be, tê wê maneyê ku kîteyên wek wê gelek kêmtir peyda dibin: "i.di.a". "-" diyar dike ku kîteyên wek wê li wê cihê nînin. "1./2.3. kîte" tê wê maneyê ka kîteya wisa dikare di kîjan cihê peyvê de peyda bibe. Hemû cûnên van kîteyan dikarin li destpêka peyvê hebin. Lê li nava yan dawîya peyvê komên konsonantan bi piranî parveyî ser du kîteyan dibin: ST "ra-weS-Tan-din".

CÛNÊN KÎTEYAN	PEYVÊN NIMÛNE		
	1. kîte	2. kîte	3. kîte
CV	<i>ma.lê</i>	<i>ma.lê</i>	<i>xwa.ri.na</i>
CVC	<i>baş</i>	<i>he.val</i>	<i>di.gir.tin</i>
CVCC	<i>dest</i>	<i>da.girt</i>	<i>da.ne.xist</i>
CCV	<i>spî</i>	-	-
CCVC	<i>stêr</i>	-	-
V	<i>e.vîn</i>	-	(i.di.a)
VC	<i>av</i>	<i>sa.et/ber.av<sup>1</sup></i>	-
VCC	<i>ast</i>	-	-
CCVCC	<i>şkest</i>	-	-
CCCV	<i>(stra.tejî)</i>	-	-
CCCVC	<i>(stran)</i>	-	-
CCCVCC	<i>(strand)</i>	-	-
CVCCC	<i>(tekst, heyşt)</i>	-	-

### Tesîra lerza dengan li ser dengrêziyê

Di kurdî de gelek deng hene ku pîrr nêzikî hev in: b/p, c/ç, d/t, g/k, j/ş, z/s, v/f. Lê ev deng ne bi temamî wek hev in. Desteya "b, c, d, g, j, z, v" dengên bilerz in (bi inglîzî "voiced") û desteya "p, ç, t, k, ş, s, f" dengên bêlerz in (bi inglîzî "voiceless" yan "unvoiced").

engên bilerz, gava ku tîr gotin, di bihurka dengî (vocal tract) anku cihê deng tê re tîr di gewriyê de lerzekê peyda dîkin. Anku ew bihurka dengî dilerize gava ku dengên "b, c, d, g, j, z, v" jê derdikevin loma navê wan konsonantan "dengên bilerz" e. Lê dengên "p, ç, t, k, ş, f" wê lerzê peyda nakin loma ew dengên bêlerz in.

Tesîra cudahiya dengên bilerz û dengên bêlerz li ser cihgirtina dengan di peyvê de heye. Di peyvên xwerû de dengê bilerz nikare bênavbîr bikeve pey dengê bêlerz û dengê bêlerz jî nikare bênavbîr li pey dengê bilerz hebe. Loma em dibêjin "rast, mişk, heft" (ne \*razt/\*rasd, \*mijk/\*mişg, \*hevd/\*hefd) û "mizgîn, hevde, hejde" (ne \*misgîn, \*hefde, \*heşde). Dengên "st, şk, ft" hemû bêlerz in û "zg, vd, jd" hemû bilerz in û dikarin li pey hev hebin. Lê di "zt, sd, jk, mg, sg, fd, şd" de herfek bilerz û yek jî bêdeng e loma ew nikarin li pey hev hebin.

<sup>1</sup> Di nimûneya "saet"ê de di nivîsînê de "-et" VC ye lê di gotinê de CVC ye. Di "berav"ê de bi nivîsînê kîtekirin "be-rav" e lê bi gotinê û ji aliyê peyvsazî û etîmolojiyê ve kîtekirin divê "ber-av" be. Di nimûneyên wek "berav"ê de kîtekirin dikare bi du awayan be, "ber-av" yan "be-rav". Lê kîtekirina li gor gotinê (ber-av) saxlemtir e. Bo nimûne, peyva "binavkirin" li gor kîtekirina nivîskî "bi-nav-ki-rin" e lê ew du maneyan dide: "nav lê kirin" yan jî "kirin bin avê". Eger mirov wê bi maneya "kirin bin avê" bi kar bîne, ew di gotinê de wek "bin-av-ki-rin" tê kîtekirin û divê di nivîsînê de jî wisa bê kîtekirin.

Dema ku em li peyvên "dikujin, dilîzin, dikevin" dinêrin, em dibînin ku "j, z, v" di rehê peyvê de hene ku hemû dengên bilerz in. Lê dema ku em li forma wan ya raderî (infinitîv) dinêrin, em dibînin ku ew "kuştin, listin, keftin" in (paşî "keftin" di piraniya devokan de bûye "ketin"). Sebebê guherîna "j, z, v" bi "ş, s, f" ew e ku "t" hatiye pey "j, z, v". Lê ji ber ku "t" dengê bêlerz e û "j, z, v" jî bilerz in, "j, z, v" guherîna û bûne "ş, z, f" yê bêlerz daku li gel T-ya bêlerz li hev bikin.

Nimûneyeka din jî peyvên "hevde, hejde" ne (li gor hin devokan "hivde, hijde/hîjde"). Ew jî peyvên "heft+deh" û "heşt+deh" pêk hatine ku di herduyan de peyva pêşîn jî du dengên bêlerz (-ft, -şt) pêk hatiye lê peyva duyem (-deh) jî bi dengê bilerz dest pê kiriye. Bo sivikkirinê T û D heliyane nav hev û dengê bilerz D jê maye: "heft+deh > \*hefde" û "\*heşde". Lê ji ber ku "f, ş" bêlerz in û "d" bilerz e, divê dîsa yek ji wan biguhere daku bikarin li hev bikin. Loma dengên bêlerz "f, ş" guherîna û bûne "v, j" loma em dibêjin "hevde, hejde/hijde/hîjde", ne "\*hefde, \*heşde/\*hişde/\*hîşde".

Bo hê baştir zelalkirina meseleyê mirov dikare guherîna peyva "dest" li destpêka hin peyvên pêkhatî (hevedudanî) bide. Ji ber ku "st" bi xwe du konsonant in, eger peyva bi wê ve kirî jî ji yek yan çend konsonantan pêk hatibe, hingê "dest" tê sivikkirin. Carinan ew dibe "des-" wek "desmal, desnimêj, despêk, deskarî" lê carinan jî dibe "dez-" (dezgeh, dezigir, dezigirtî, dezbilînk, dezvala). Sebebê guherîna S bi Z jî ew e ku di nimûneyên me de dengê G yan V yê bilerz S-ya bêlerz kiriye Z-ya bilerz.

Ev fenomen di gelek zimanên din de jî heye. Bo nimûne, di inglîzî de peyva "leave" (hiştin, çûn, rê dan...) di dema borî de dibe "left" (ne \*levt) ji ber ku T-ya bêlerz û V-ya bilerz nikarin li pey hev hebin.

i guherîna dangan de peyva pêştir li gor peyva paştir dika: "heft+deh > hevde" (F-ya bêlerz ji ber D-ya bilerz bûye V-ya bilerz) lê "di-kuj-im > kuş-tin" (J-ya bilerz ji ber T-ya bêlerz bûye Ş-ya bêlerz).

Hin kes, ji ber ku di rehê peyvên wek "dikujin, dilîzin, dikevin" dengên "j, z, v" hene, formên wan yê raderî jî wek "kujtin, lîztin, kevtin" dinivîsin. Lê ev hem ne li gor dengnasiya kurmançî ye û hem jî li gor lerdarî û bêlerziya dangan xeletiyeka berçav e ku ji hîperkorektiya şaş tê kirin.

### **i-ya revok û kîtekirin**

Di nivîsîna kurdî de mirov dikare gelek peyvan bi du awayan bibîne ku di yekê de "i" heye û di awayê din de jî "î" nîne. Bo nimûne: "kevin/kevn, nizim/nizm, germ/gerim"...

Sebebê dudiliya li ser awayê rast yê nivîsîna van peyvan ew e ku li gor dengên li pey wan peyvan "i" jî tê bihîstin yan jî nayê bihîstin. Bo nimûne, eger em bibêjin "ev kiras kevn e", hingê dawîya wê hevokê wek "kev-ne" tê gotin, ne wek "ke-vi-ne". Anku "kevn+e" bi hev re dikare bi du derbeyan bê gotin yanî dibe komikeka du-kîteyî. Lê eger em bibêjin "ev derpê hê jî kevntir e", hingê dawîya hevokê wek "ke-vin-ti-re" tê bilêvkirin.



Ev diyarde/fenomen jî encama kêmkirin û sivikkirina koma konsonantan e. Bi heman awayî "destpêk, destmal" di axiftinê de dibin "despêk, desmal". Kurmancî di nivîsînê de tehemila sê konsonantan li dawîya kêteyê bike jî, di axiftinê de ew sist dibe.

### **i-ya têrneker û kêtekirin**

Wek qeyd û bendeka giştî mirov dikare bibêje ku her vokala kurdî bi tenê yan li gel konsonantên li dora xwe kêteyekê pêk bîne. Vokala "î" jî wisa ye. Lê dîsa jî hin peyv hene ku "î" tê de heye û vokaleka din jî heye lê dîsa jî ew ne dukîteyî lê yekkîteyî ne. Bo nimûne, di peyvên "bira, jîyan, ziman" de di her yekê de du vokal hene lê dîsa jî her yek ji wan peyveka yekkîteyî ye. Anku di axiftinê de mirov divê wan bi derbekê bibêje (bira, jîyan, ziman) wek ku "î" di wan de tine be (bra, zman). Tenê bi zor û tadeyeka nesiritî mirov dikare bibêje "\*bi-ra, \*ji-yan, \*zi-man". Herwiha di peyvên wek "siyaset, xiyanet" jî sê vokal hene lê dîsa jî ew di axiftinê de peyvên dukîteyî ne, "siya-set, xiya-net", ne "\*si-ya-set, xi-ya-net".

### **Dengrêzî di ser kêteyan re**

Heta niha me behsa wê kiriye ku deng çawa dikarin di kêteyekê de bèn rêzkin. Me diyar kiriye ku di dawîya kêteyê bi piranî vokalek, konsonantek yan jî herî zêde du vokal dikarin hebin. Tek kêteyên bi sê konsonantan bi dawî tînin di peyva devokî "heşt" û peyva esil-biyani "tekst/têkst" de heye.

Lê di rastiyê de ji sêyan zêdetir jî konsonantan di peyvê de bikevin pey hev. Bo nimûne, di peyva xwemalî "goşt-xwer" de çar konsonant (Ş, T, X, W) li pey hev in. Mirov dikare ji kesê ku di tekstan bixwîne re bibêje "tekstxwîn" (bide ber Qur'anxwîn, kitêbxwîn, dersxwîn). Di "tekstxwîn"ê de pênc konsonant li pey hev in.

Lê di peyvên wan de koma konsonantan li ser du kêteyan parve dibe: "goşt-xwer, tekst-xwîn" loma hejmareka wiha mezin ya konsonantan li pey hev mimkin e. Ji ber parvebûna koma konsonantan li ser du kêteyan e ku komên wek CCCVC yan CCCVCC tenê di kêteya yekem ya peyvê de mimkin in lê ne di kêteyên li peyvê de: "strand" ("stran got", CCCVC) lê "nes-trand" ("stran negot, nekir stran", CVC-CCVCC).

Li gel peyvên bi pêşgir (bêstratejî: "ya ku stratejî nîne", bistran: "ya ku stran heye") mirov dikare pêşgirê wek kêteyeka serbixwe bihejmêre ("bê-stratejî, bistran") yan jî li gor gotinê koma konsonantan sivik bike ("bê-stratejî, bis-tran").